

ZANYARÎYA JI BO NEXWEŞÎ

Levetiracetam Actavis

Ji bo dermankirina atîyê

! Zanyarîya giring!

Berêya standina Levetiracetam Actavis-ê bi dixtorê xwe re, karkerê dermanxaneyê re an jî hemşîreyê re têkilî bike:

- çî nîşanên êrîşkarîyê, depresyonê û/an ramane xwekuştinê hebin
- pirsên êşa ji ber gurçikê

Berêya ku ta ciddîtir bibin bi dixtorê xwe re têkilî bike (w.n. jimara bêtir). Ji bo zanyarîya bêtir, li rêçeteya zanyarîya ji bo nexweşî ya di pakêtê de binihêre.

Divê Levetiracetam Actavis çawa were bikaranîn

Her car Levetiracetam Actavis-ê li gora şîreta dixtorê xwe bi kar bîne. Eger tu qenc nizanibî, divê tu li şîreta dixtorê xwe an jî xebatkarê dermanxaneyê xwe guhdarî bikî. Dermankirin, di rewşa asa de bi doza kêmtir dest pê dibe û paşê derece bi derecê tê bêtirkirin. Ji bo têgihîştina doza herfî baş a ji bo te dibe ku hinek zeman bivê. Heb, divên di heman dema/demên her rojekê de werin standin. Levetiracetam Actavis kare bi xwarinê an bêyî xwarinê were standin. Hebên Levetiracetam Actavis-ê di aveka têt de bihelînin (w.n. qedehêka avê).

Her car bi temamî doza ji alîyê dixtorê te ve hatiye xuyandin bi kar bîne. Tu car hebê perçe neke û nexwe.



Divê dermankirin çî qas zeman devam bike?

Dê dixtorê te biryar bide ka dê dermankirina te çî qas zeman devam bike. Gelek giring e ku tu bêyî têkilîkirina dixtorê xwe dermankirina xwe ranewestî. Ji nişka ve rawestandina dermankirina bi Topiramate Actavis dibe bibe sebebê xetera bêtirbûna çendîn felcan. Eger ku ji ber çî sebebê dermankirina te hat rawestandin, doz, wekî ku di rêçeteya ku te ji dixtorê xwe wergirtîyê de jî hatiye xuyandin divê derece bi derece were kêmkirin.


Eger ez Levetiracetam Actavis-ê zêde bistînim divê ez çî bikim?

Bandorên kêlekî yê standina doza zêde ji Levetiracetam

Actavis-ê xewokibûn, hejîn, êrîşkarî û kêmbûna baldariyê ne. Eger te bêtirî xuyandina dixtorê xwe heban daqurtandibe pê re têkilî bike.

Eger ez ji bîr bikim derman bistînim divê ez çî bikim?

Eger te di ser dozê an çendan de qebaz dabe bi dixtorê xwe re têkilî bike. Ji bo telafîkirina heba jibîrkirî cot doz nestîne.



ZANYARÎYA JI BO NEXWEŞÎ

Levetiracetam Actavis

Ji bo dermankirina atîyê

Bandorên kêlekî yên gelek tîn dîtin çî ne?

Wek dermanên din, ev derman jî dibe bibe sebebê bandorên kêlekî, lê her kesek mûheqqeq jê janê nakişîne. Bandorên kêlekî yên “gelekdtî” û ji 10 nexweşan bi 11 re kêma-iltîhaba bêvlê, û/an qirikê, xewokîbûn û êşa serî ye. Hin ji bandorên kêlekî yên wek xewokîbûn û gêjbûnê dibin ku di destpêka dermankirinê de an jî bêtirkirina dozê de bêtir peyda bibin. Tevlî vî awayî, bandorên kêlekî divên di nav zemanî de kêmtir bibin.

Li ser bandorên kêlekî zanyariya bêtir kare di reçeteya haydarkirina nexweşî ya di pakêtê de were dîtin.

More information on side effects can be found in the patient information leaflet inside the package.

Gelo ez karim dermanên din bistînim?

Pirsên peydabûna tevlibûna Levetiracetam Actavis-ê û dermanên din kê in, lê tiştê giring ji bo te ew e ku tu dixtorê xwe mûheqqeq ji dermanên xwe yên tu wan bi kar tîni haydar bikî.

Di nava wan de dermanên ku bêyî reçete tîn firotin û dermanên Kurmancî jî hene.

Ez karim biajonim?

Levetiracetam Actavis dibe ku karîna ajotina te ya ‘erebeyê birêvebirina hacetan û mekîneyan ji ber lawaz bike, ji ber ku ev derman dibe te xewokî bike. Ev, di destpêka dermankirinê de an jî piştî bêtirkirina dozê hê muhtemeltir e. Heta ku tu zanibî karîna te zirarê nedîtiye divê tu ‘erebeyekê neajonî an mekîneyekê bi rê ve nebî. Tevlî vî awayî, bera di bîra te de be ku dema ku bi te re nexweşîna atîyê hebe, ji bo destûra ajotina wasîteyekê divê tu di seranserê salekê de hîç bi atîyê nekevî.



Gelo ez karim araqê vexwim?

Ji bo kesên ji atîyê bijan in, ji bilî pêşniyariyeka tevahî ya li ser vexwarina araqê zêde, hîç tixûbkirineka taybet tune ye.

Bihembûn û mijandin

Lêkolînên mezin nîşan didin ku li ser fetusê-cenînê hîç bandoreka wê tune ye, lê her car bi şîreta dixtorê xwe bike, ji ber ku bandora wê ya li ser fetusê-cenînê nikari bi temamî were avêtin pişt guhî. Eger tû bihembû, bêyî guhdarîkirina li şîreta dixtorê xwe dermankirinê ranewestîne.

Dereceya Levetiracetam Actavis-ê ya di nava xwîynê de di seranserê hemlê de, bi taybetî jî ber bi paşîya hemlê ve kare biguhere. Ji ber vî awayî, dê car caran ji dixtorê te re nimûneyên xwîynê bivên da ku ew karibe dereceya Levetiracetam Actavis-ê binirxîne û lazim be doza wê were guherandin.

Levetiracetam bi şîrê çîçîkê-memikê re tê avêtin, ji ber vî awayî xeter û feydeyên mijandinê bi dixtorê xwe re bide û bistîne.



.....

.....

.....

.....

.....

